

Şertê dahatê yê bihevghandina malbatî ya wergirên mafê penaberiye

Eger (ev zêde ye) şîret bo te ye eger te ji Finlandayê mafê penaberiye wergirtibe yan di kotaya penaberiye de bo Finlandayê qebûl bûbî.

Malbatiyên te dikarin dawa îqameyê ji Finlandayê bikin ji ber ku te îqame li Finlandayê wergirtiye.

Malbatiyên berê (temenmezin) dikarin di dema sê mehan de bêyî şertê dahata misogerkirî dawa bikin

Eger malbata te berî hatina Finlandayê hatibe avakirin (penaxwaz) yan berî qebûlkirina te di kotaya penaberiye de (penaberên kotayî), malbatiyên te dikarin dawa îqameyê bikin **bêyî şertê dahata misogerkirî di dema sê mehan de**. Dem ji wê rojê tê hejmartin ku te biryara mafê penaberiye ya qebûlkirina penaberîya kotayî wergirtiye.

Malbatiyên te dikarin herwiha piştî sê mehan jî dawa îqameyê ji ber têkiliya malbatî bikin. Lê hingê **şertê dahata misogerkirî tê danîn**.

Dahata malbatiyên nû divê misogerkirî be

Eger malbata te hatibe avakirin piştî hatina te ya Finlandayê (penaxwaz) yan piştî qebûlkirina di kotaya penaberiye de (penaberên kotayî), **dahata malbatê divê misogerkirî be**.

Malbatiyên te wiha di dema sê mehan de dawa dikin:

Malbatiyên te divê berî hatina Finlandayê dawa îqameyê bikin. Mirov dikare îqameyê li ser kaxezê bide balyozxaneyê yan li navenda îqameyê yan bi elektronîkî li ser malpera Enter Finland.

Kî malbatiyên te ne

Malbatiyên te ev in

- hevjinên zewicî
- hevjinên qeydkirî
- hevjinên nezewicî
- dêbavên (nêrevanên) zarokên kêmtir ji 18 salî
- zarokên nezewicî yê kêmtir ji 18 salî

Radestkirina dawanameya kaxezî

Amadekariyên bo dawakirina îqameyê baş e ku yekser piştî wergirtina îqameya xwe dest pê bikî. Endamên malbatê belkî bo nimûne hewceyî vîzeyê bidin (bibin) daku bikarin biçin dawanameya xwe bidin balyozxaneyê yan navenda îqameyan. Malbatiyên te bi xwe berpirsîyar in ku di dema diyarkirî de dawanameya xwe radest bikin.

Malbatiyên te divê ji malpera wezareta derve ya Finlandayê finlandabroad.fi lê binêrin ka dikarin li kû û çawa îqameyê radest bikin û çawa demekê bo radestkirina îqameyê bigirin. Daîreya Koçberan nikare tesîrê li wê bike ka divê li kû û kengî malbatiyên te îqameyê radest bikin. Hemû kesên dawa îqameyê dikan, divê biçin cihê radestkirinê, zarok jî.

Eger bo radestkirina dawanameyê demgirtin ne hewce be:

Eger bo radestkirina dawanameyê demgirtin ne hewce be, dawaname divê di dema sê mehan de were radestkirin.

Eger bo radestkirina dawanameyê demgirtin hewce be:

Eger bo radestkirina dawanameyê demgirtin hewce be, malbatiyên te divê di zûtirîn demê de û herî dereng di heyama sê mehan de têkiliyê li gel balyozxaneyê yan navenda îqameyê bigirin daku dawanameyan radest bikin. Divê ew bo radestkirina dawanameyan demekê bigirin.

Gava ku ew dem bigirin, divê ew agahiyên hemû wan kesan bidin ku dixwazin dawa îqameyê bikin.

Divê ew van agahiyan bidin:

- navên temam yên hemû dawakeran, demên deqîq yên jidayikbûnê û welatîniyên wan
- navê te, dema jidayikbûna ye (te) û welatîniyên wan (te) û hejmara mişteriyatiya te li Daîreya Koçberan.

Eger malbata te wek şîretkirî bike, lê ew di dema sê mehan de nikarin ji ber dora dirêj ya demgirtinê nikarin demekê bigirin, ew dîsa jî dikarin bêyî şertên dahata misogerkirî dawa îqameyê bikin. Malbata te dive yekem dema mimkin bigirin û (ev û zêde ye) bo radestkirina dawanameyên îqameyê radest bikin.

Eger radestkirina îqameyê ji ber sebebekî ne sûcê karmendên Finlandayê be, istisna ji dema diyarkirî ya sê mehan ne mimkin e.

Radestkirina dawanameyê li ser malpera Enter Finland

Malbata te dikare dawa îqameyê herwiha li ser malpera Daîreya Koçberan ya Enter Finland (enterfinland.fi) jî bike. Dawanameya elektronîkî divê di dema sê mehan de were radestkirin daku şertên dahatê neyên danîn.

Gava ku malbatiyên te dawanameya xwe li ser malpera Enter Finland radest kir, divê ew hê nasnameya xwe bibin kontrolkirinê. Malpera Enter Finland dê şîretên pêwîst li ser vê bide wan.

Dawaname bi pare ne

Dawakirin bi pare ye. Bihayên dawanameyan li ser malpera Daîreya Koçberan in migri.fi

Agahiyên zêdetir li malpera Daîreya Koçberan

Agahiyên zêdetir derbarê dawakirina îqameyê li ser malpera Daîreya Koçberan hene migri.fi.